




Çîroka Kevjaleke Bêqalik Author: Radha Rangarajan


Illustrator: Rohan Dahotre

Translator: Hekîm Kılıç, Yekmal e. V.

Level 2









Sorê, qalikekî reş peyda kir û xwest zûka têkeve hundirê wê. Lê dengekî bihêrs got, "Bicehime here! Ez di hundirê wê de me û divê ez hinekî razêm."

Sorê, şeytanokê li dû xwe hişt û bi dû qalikekî nuh ket.



Sorê qalikekî şîn dît û ber bi wê ve baz da. Lê ev ne ew qalik bû. Ev qapaxeke plastîk bû û şûşeya wê jî di bin qûmê de mabû.




Sorê vê carê, qalikekî zer dît û ber bi wê ve baz da. Lê ev ne ew qalik bû. Tenê, felqeyek lîmoneke guvaştî bû.




Sorê qalikekî spî dît û bi aliyê dinê baz da. Lê ev jî ne ew qalik bû. Qalikê hêkekê bû û zerdika wê jî giş hatibû xwarin.


Bû pitpita Sorê, "Ev qalik wê di cî de hûrhûrî bibe!"



Sorê qalikekî rengê binevşî dît û bi pêş ve baz da. Lê ev jî ne ew qalik bû. Çîkolata hatibû xwarin û ambalaja wê jî hatibû avêtin.




Sorê vê carê jî qalikekî pembe dît û di cî de sekinî. Lê ev jî ne ew qalik bû. Tiliyek liviya û piştre jî nigek xuya bû. Ev çîpekî ecêb mezin ê zilamekî bû û li plajê di xew re çûbû! Bû hîqehîqa Sorê, "Ez dibêjim qey min ew diqdiqand!"



Sorê qalikekî rengê qehweyî dît û bi çargavî çûyê. Lê ev jî ne ew qalik bû. Fisteqên erdê hatibûn xwarin û qalikên vala li derdorê belav bibûn.

Bû himehima Sorê, "Ew ê bi ber ba bikeve û bifire!"



Sorê li ampûleke şikestî, pakêteke biskewît û bişkokeke zengarî rast hat. Lê ev jî ne ew qalik bûn.



Axirê, Sorê hevala xwe Binevşê dît ku ji xwe re dikeve hundirê qalikekî nuh. Binevşê got, "Wê ev qalikê nuh bêhtir li min bê!" Piştre, Binevşê qalikê xwe yê kevn li dû xwe hişt û çû.



Sorê, ew qalikê kesk ê kevn ceriband û pir xweş jî lê hat. Sorê kêfa wê xweş, ruyê wê li ken, qalikê xwe yê nuh baş himbêz kir û bi hevalên xwe re bi dûr ketin!



Sorê kevjaleke hermit (bi tenê) e. Beravajî kevjalên din, kevjalên hermit ne xwediyê qalikekî hişk in. Ji ber vê yekê, qalikên vala ku şeytanok berdidin peyda dikin û ji xwe re dikin malên nuh. Her ku mezin dibin, qalikên wan li wan teng dibin. Û pêdiviya wan bi qalikên mezintir ku karibin têkevênê, çêdibe!

Rebena Sorê heta ku qalikekî vala peyda kir zehmetî kişand. Ji ber ku plaj tije çop û bermayî bûn. Plastîk û bermayiyên metal weke pîpet, şûşe, torbe, torên masiyan û qutiyên konserveyan gelek caran digihêjin heta çem û okyanûsên me. Ev hemû tişt ji bo jiyana behrê bizerar e. Heger em bixwazin alîkariya Sorê û hevalên wê bikin, divê em okyanûsan paqij bihêlin!





This book was made possible by Pratham Books' StoryWeaver platform. Content under Creative Commons licenses can be downloaded, translated and can even be used to create new stories - provided you give appropriate credit, and indicate if changes were made. To know more about this, and the full terms of use and attribution, please visit the following link.

Story Attribution:

This story: Çîroka Kevjaleke Bêqalik is translated by Hekîm Kılıç, Yekmal e. V., 2020. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Based on Original story: 'A Suitable Shell', by Radha Rangarajan . © Pratham Books , 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license.

Images Attributions:

Cover page: Hermit crab on top of a rock by the beach, by Rohan Dahotre © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 3: crab on the sand, by Rohan Dahotre © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 3: crab on the sand feeling hot, by Rohan Dahotre © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 4: crab thinking, by Rohan Dahotre © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 5: Crab staring at a crane on the beach, by Rohan Dahotre © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 6: Snail inside its shell, by Rohan Dahotre © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 7: crab carrying a bottle cap, by Rohan Dahotre © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 9: crab sits on a broken egg, by Rohan Dahotre © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 9: crab sits on a broken egg, by Rohan Dahotre © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 10: a crab inside a plastic wrapper, by Rohan Dahotre © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 10: a crab inside a plastic wrapper, by Rohan Dahotre © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license.

Disclaimer: https://www.storyweaver.org.in/terms and conditions





This book was made possible by Pratham Books' StoryWeaver platform. Content under Creative Commons licenses can be downloaded, translated and can even be used to create new stories - provided you give appropriate credit, and indicate if changes were made. To know more about this, and the full terms of use and attribution, please visit the following Link.

Images Attributions:

Page 11: <u>Crab tickling the toe</u>, by <u>Rohan Dahotre</u> © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 12: <u>Crab inside a paper bag</u>, by <u>Rohan Dahotre</u> © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 13: <u>sad crab wandering around on the seashore</u>, by <u>Rohan Dahotre</u> © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 14: <u>Two happy crabs on sand by the sea</u>, by <u>Rohan Dahotre</u> © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 15: <u>Five Crabs crawling towards sea waves</u>, by <u>Rohan Dahotre</u> © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license. Page 16: <u>sleeping happy crab</u>, by <u>Rohan Dahotre</u> © Pratham Books, 2018. Some rights reserved. Released under CC BY 4.0 license.

Disclaimer: https://www.storyweaver.org.in/terms and conditions



Some rights reserved. This book is CC-BY-4.0 licensed. You can copy, modify, distribute and perform the work, even for commercial purposes, all without asking permission. For full terms of use and attribution, http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

Çîroka Kevjaleke Bêqalik (Kurdish (Latin Script))

Kevjaleke hermit bi navê Sorê, qalikê xwe wenda dike. Ji bo qalikekî lêhatî li hemû plajê digere, lê rastî bermayî, mirov û şeytanokên bihêrs dibe. Gelo wê Sorê karibe ji xwe re qalikekî peyda bike berî ku hewa pir qerm bibe?

This is a Level 2 book for children who recognize familiar words and can read new words with help.



Pratham Books goes digital to weave a whole new chapter in the realm of multilingual children's stories. Knitting together children, authors, illustrators and publishers. Folding in teachers, and translators. To create a rich fabric of openly licensed multilingual stories for the children of India and the world. Our unique online platform, StoryWeaver, is a playground where children, parents, teachers and librarians can get creative. Come, start weaving today, and help us get a book in every child's hand!